



Şêweselî:
Mixabin Rasan aşek e
ku bi XWÎN û rondikan
digere

»»» R:5



Mistefa Hicrî:

Em dikarin di hemû waran de serkevtinên mezin û berçav bi dest bixin

»»» R:3

Bidestveanîna mafên netewî yê gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (321) 06-03-2018 Buha (1000) Tûmen

16.emîn kongireya PDKÎ, hemû pîlanên gemar pûç kirin

Di demekê de ku hemû hewla dijmin û neyarên reng-bireng ên PDKÎ û gelê Kurd ew bû ku derbê li vê kongireya PDKÎ bidin, û PDKÎ bixin qedeman, lê PDKÎ bi hişyariya xwe karî bi ser hemû astengiyên de serkeve, û mizgîniya bidawîhatina serkevtina vê kongireyê bide hemû dilsoj û azadîxwazên Kurd û Kurdistanê, û vê peyamê jî bide dijmin ku ew nikarin bi dek û dolabên xwe pêngavên bihêz û îradeya hesinî ya Demokrat ji xebatê sist bikin.

Her di vê derheqê de bû ku roja 9'ê Reşemê Navenda Siyasetî ya PDKÎ hîlbijartiya kongireya 16.mîn ya PDKÎ bi belavkirina daxûyanîyekê ragehand:

“Ji riya vê daxuyaniyê ve em hemû aliyekî aghdar dikin, ku 16.mîn kongireya PDKÎ êvariya roja Sêşemiyê 1'ê Reşemeha 1396'an (20.02.2018) an li gora vê bernameyê ku wekî destûra kar hatibû diyarîkirin, dest pê kir, û piştî çar rojan karê berdewam derengîyeke şeva Înê li ser Şemiyê, rêkewt 4'ê Reşemehê dawî bi karên xwe anî.

Kongireya 16.mîn ya PDKÎ di rewşeke taybetî û navçeyî de bi rê ve çû, ku pêwîst bû hem di warê siyasî û hem jî di warê emnîyetî de, girîngî-

yeke berçav pê bê dan. Bi taybet ku Komara Îslamî ya Îranê bo derbelêdana li kongirê, yan pêşgirtin ji birêveçûna wê, di nava hewldanan û pîlandarêtinan de bû. Bi xweşî ve PDKÎ bi berçavgirtina hemû erkan bi taybetî di warê dem û cihê kongirê û parastina ewlehiya cihê kongirê hûrbînane reftar kir, lewra jî kongire di vî warî de bi awayekî serkevtî bi rê ve çû.

Salona kongirê bi çendîn diruşman hatibû xemilandin, ku eyankerê bîrûboçûnên demokratîk, neteweyî, û dadperwerane yê PDKÎ bû, ku kongire wekî kongireya “Rasana Rojhilat” pênase kiribû.

Kursiyên hevalên şehîd, Çeko Rehîmî, Kawe Cewanmerd, û Hêmin Mewlannijad ku nûnerê kongirê bûn, lê mixabin bi sedema şehîdbûna wan, berî birêveçûna kongirê betal bûn, bi qevdên gulan hatibûne xemilandin.

16.mîn kongireya PDKÎ bi sirûda neteweyî ya “Ey Reqîb” û ragirtina bîstekê bêdengî, dest bi karên xwe kir, û piştê hevalê rêzdar Hesên Şerefî berpîrsê Komîteya Amadekar ya kongireya 16'an, rapora karên ve komîtê pêşkêşî endamên kongirê kir.

Piştî pesendkirina raporê, deng bo rewayiya kongire wergirt, ku nûnerên beşdar di kongirê de bi dengê giştî

rewayiya kongirê pejirandin, û kongire bi awayekî fermî kete qonaxa birêvebirina wan bernameyên ku di destûra karê kongirê de bûn.

Li gora vê bernameyê destpêkê daxwaz ji têkoşe rû kesayetiye naskirî ê hizba me, kak Mela Hesên Şêweselî hate kirin ku gotara vekirina kongirê pêşkêş bike.

Vî rêzdarî di peyama xwe de tevî îşarekirina bi rewşa navçê û cihê PDKÎ di qada xebata Kurdistanê Rojhilat de, tebahiya navmala Kurd û yekrêziya kadr û pêşmerge û endamên PDKÎ bi pêwîstîyeke girîng zanî, ku ew peyama navbirî bi germî pêşwazî jê hate kirin.

Di qonaxeke din ya karê kongirê de rapora siyasî ya Komîteya Navendî ji aliyê Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ ve pêşkêşî kongirê hate kirin. Vê raporê rewşa cihanî û helwestên welatên mezinhez û bibandor li ser rewta bûyerên navçê û Îranê, û doza Kurd bi giştî, û herwiha aloziyên Rojhilata Navîn û rola têkderane ya Komara



Îslamî di vê navçê de xistibû berçav, û rewşa niha ya Îranê û xebata xelkê Îranê bo azadî û mafên wan bi hûr îşare pê kiribû.

Di raporê de, doza Kurd bi giştî di hemû perçeyê Kurdistanê de, bi vî awayî ku heye bas jê hatibû kirin, û tevgera Kurd di Rojhilata Kurdistanê û rola hêzên siyasî ên Kurd di vê naçeyê de, û pêwîstiya hevkarî û hevxeberiya van hêzan, û xortên neteweya Kurd pê li ser hatibû dagirtin.

Di vê çarçoveyê de, sergirtina enî yan hevalbendiyekê di navbera hêzên siyasî ên Kurdistanê Rojhilat û Îranê de, bi girîngî ve jê hatibû nihêrîn, û vêdedana astengiyên li ser riya ve mebestê, bas jî hatibû kirin. Di vê pêwendiyê de îşare bi vî hatibû kirin, ku heya gihîştina bi “yekgirtin”ê,

PDKÎ amadeyî û beşdariya “Hevalên Pêşîn” li her “teşekul”ek, yan “bere”, yan “hevalbendî”yekê, di nav hêzên Kurdî û Îranî de, nake astenga amadebûna PDKÎ di vê eniyê, yan hevalbendiyê Kurdî yan Îranî de.

Beşeke din ya raporê hatibû danîn bo girîngîdana bi “Rasana Rojhilat” ku di vî warî de şêweya berfirehkirin û bibandortirbûna wê hatibû destnîşankirin, û endamên kongirê di çend rûniştinan de, gellek çalakane beşdarî bas û eşkerekirina boçûnan li ser her yek ji beşên raporê bûn, ku tebîni û boçûnên wan, rapor dewlemendtir kir.

Di encamê de, di dengwergirtinê de, rapor bi piranyê berçav hate pejirandin, diyare koma bas û mijarên ve raporê wê piştê, bêne çap û belavkirin, û hemû aliyek wê raporê, wê bibînin.

Beşeke din ya karê kongirê bas li ser terhê guherîna pêkhatiya hizbê bû. Terhek li ser bingeha dabeşkirina deshilatê û girîngîdan bi buhayên teşkilata navxweyî, ku guhertineke bingehîn di pêkhatiya hizbê de pêk tîne. Lewra bi qasî girîngiya wê, di heyama zêdetir

»»» R:4

Sergotar

Kongireya Rasana
Rojhilat

N: Kerîm Perwîzî

Pîştî nêzik bi yek sal derbazbû-
na bi ser wextê xwe de, kon-
gireya 16.emîn ya PDKÎ di roja 1`ê
Reşemeha sala 1396`an de dest bi
karên xwe kir, û piştî çar rojan karê
berdewam û têrûteji, û bi şev û roj
dirêjkêşana civînan, li 4`ê Reşemê
de kongireya Rasana Rojhilat
hemû ew bernamên ku bo karê xwe
danîbûn, bi serkevtin û bi serûberî bi
encam gehandin.

Rewşa zemanî ya kongireya Rasana
Rojhilat û bi taybetî nemana bel-
laxa DAÎŞ`ê, û hatina bellaxa Heşda
Şe`ibî piştî bûyerên Kerkûkê, û êrîşa
Tirkîyê li ser Efrînê û gazîkirina
Esed bo Efrînê, û çendîn bûyerên
girîng ên din, her yek ji wan bi cuda
hilgîrê şiroveyên cuda ne, û emê
hewl bidin di pêşerojê de biçin ser
van basan. Di warê naveroka karê
kongirê de jî, yekem kongireya piştî
destpêka qonaxa nû ya xebatê wate
Rasana Rojhilat bû, û bernamên
kongirê di vî warî de, û herweha
pêngavên PDKÎ bo hevkarî di nava
hêzên Kurdistanî û herweha pirs
û mijarên pêwendîdar bi rêxistin
û organîzasyon û xwe teyarkir-
rina PDKÎ, hemûyan jî girîngiya
taybet, û cihê xwe yê taybet hene
bo şirovekirina zêdetir, ku dibe di
derfeteke din de her hemû jî bêne
baskirin, lê eva ku wekî emegdari-
yekê di hemberî hemû wan kesên
ku zehmetî bona pêkhatina kongirê
kêşan, û hemû ewên ku bi dilekutê
ve, çaveriyê kongirê û encamên wê
bûn, hewce ye ku di çend xalên kurt
de em îşarê pê bikin.

Yekem-Serkevtina kongirê di
biyavê birêvebirina karên xwe
di rewşa ewlehiya taybet de bû,
rengê gellek hûrdekarî û zanyarî di
derfeteke weha de nehêne baski-
rin, lê îşareyeke bilez bi vê hewce
ye, ku di rewşa xirap ya ewlehiya
piştî dagîrkirina Kerkûkê ji aliyê
Heşda Şe`ibî ya ser bi Spaha Pas-
daran û vegeşiyana destêwerdanên
şerxwazane yê Spaha Pasdaran û bi
giştî Kurdistanî Başûr, û bi taybetî

Şehîd "Sebah Rehmanî" bi axê hate spartin

Di rêûresmekê de şehîd "Sebah
Rehmanî" ku bi destê terorîstên-
Tehranê, di bajarê Hewlêrê de hatibû
şehîdkirin, di goristana şehîdên PDKÎ
de bi axê hate spartin.

Nûçegihanê malpera
"Kurdistanmedia"yê, ragehand ku
roja Înê 11`ê Reşemeha 1396`an, bi
beşdariya Lêpirsrawê giştî yê PDKÎ û
endamên Navenda Siyasî a Hizbê, kadr,
pêşmerge, malbat û mêhvananên beşdar,
termê şehîd "Sebah Rehmanî", ku roja
Pêncşemî bi destê terorîstên rejîma
Tehranê di bajarê Hewlêrê de hatibû
şehîdkirin, di goristana şehîdên PDKÎ
de bi axê hate spartin.



Di vê rêûresmê de, "Hesen Şereffî" cihgirê lêpirsrawê giştî yê PDKÎ û berpîrsê navenda siyasî axivî. Şereffî di axavtina xwe de bas ji vê kir ku, îro em li rêûresma bi axê spartina xebatkarê neteweya me şehîd "Sebah Rehmanî" yê temen 33 salî, û kurê "Selah Rehmanî" kom bûne, da ku termê pîroz yê wî bi axa pîroz a Kurdistanê bispêrin. Şereffî di doma axavtinê xwe de ragehand ku, du rojan berî niha destê terorîstên rejîma kevneperest a rejîma Îslamî a Îranê, gihîşte mala rêzdar "Selah" û bi zeliqandina bombeyek bi tirombêla wî ve, ku di encama vê kiriyara terorîstî ya rejîmê de, Selah digel kurê xwe bibûne armanc, di encamê de jî Sebah jiber kûrbûna birînan canê xwe ji dest da, û Selah jî birîndar bûye.

Berpîrsê Navenda Siyasî a PDKÎ, di beşeke din a axavtinê xwe de got ku, rejîma Îranê ji tevgera kurd di Rojhilatê Kurdis-
tanê de ditirse, û ji ber tîrsa têkoşan û xebata PDKÎ, dest ji bo hemû karekî ku teror yek ji wan e dibe lê, bila rejîma Îranê vê
yekê bizane bi encama kiryarên bi vî rengî, gavên me sist nabin belku bihêztir dibin.

Piştî rêzdar "Selah Rehmanî" bavê şehîd "Sebah" axivî.

Rêzdar "Selah" di axavtina xwe de got ku bila rejîma terorîst a Îslamî a Îranê vê yekê bizanbe, ku bi vê kiriyara rejîmê,
îradeya min sist nabe û ezê tola vê kiriyara terorîstî bistînim. Navbirî herwisa got ku, sê kurê min hene, ezê her sê kurên xwe
goriyê PDKÎ bikim, û ev kiriyara rejîmê pêngavên min ji xebatê sist nake, belku gavên min ji bo pêşveçûnê bihêztir dike.

wêneyeke giştî ji metirsiyên terorîstî ên Komara Îslamî bo ser xebatkarên me yê Kurd ji me re eşkere bike. Bi taybetî di
civîn û rûdaweke girîng wekî kongireya hizbeke cidî û xwedîmetirsî bo ser Komara Îslamî de, zêdetir rewşa ewlehiyê xûya
dike, û ew nûçe û zanyarî jî ku digehîştin destên me, nişan didan ku Komara Îslamî bi hemû awayekî li pey wê ye, ku cih û
dema kongire bizane, û êrîşî ser bike, û bi handana hinek bîrûrayan, dixwast ku bi awayê nerasterast wan zanyariyan bi dest
bixe, ku bi hişyariya PDKÎ û hevkarîya kadr û pêmerge û malbatên wan ku pêwendîdar bi vî karî bûn, kongire bi ew qasê
emniyeta baş ve li ser şiyarên PDKÎ bixwe bi rê ve çû. Hêjayî îşarepêkirinê ye, li yek du rojên berî destpêka kongirê de,
dawî cihê kongirê bi neçarî guherîn bi ser de hat, û zanyariyên hûrtir di vî warî de bila bimîne, bo wexteke din, û rêkewteke
din.

Lê serkevtina vê kongirê di vê rewşa pîr ji metirsî de, ku mixabin her hefteyekê piştî bidawîhatina kongirê mal û malbat û
canê endamê kongirê bû armanca kiriyareke terorîstî di Binesilaweya Hewlêrê de, ku bixwe eyankerê tewaw ya rewşa pîr
metirsî ye, û şanaziya serkevtina kongirê di rewşeke weha de zêdetir dike.

Duyem- Baseke girîng û pîr kêşe û pîr lêdwan û bi helwestên cuda û deng û bîrûraya gellek cuda, li ser guherîna sîstemê di
PDKÎ di heyama sê salên borî de, di nava bedene û rêberatiya PDKÎ de, di holê de bû. Ew basa girîng rawestiyar û xwen-
dineke cidî bû, bo koma kêşe û kêmasiyên PDKÎ, û vegeriyan li pey rêçareya rîşeyî, û piştî zêdetir ji çar dehikan cihgirtina
sîstemeke rêxiraweyî, PDKÎ dixwast ku saxtara xwe biguhere. Ew basa girîng û rayên cuda li ser wê, dost û heval xistibûna
nava dilkutê de, û ken xistibû ser lêvên dijîman, û ew anîbûne ser xet, da ku hewla hûrkirina PDKÎ bidin, lê piştî çend salan
berhevdan û baskirinê PDKÎ di kongireya 16.emîn ya xwe de, gihîşte yekdengî û guherîna pêkhate û sîstema xwe, û basên
pêwendîdar gihandine encamê, û biryara komdengiyê lê ket, eva hem zindîbûna vê hizbê û hem jî serdemîbûn û hem jî
diyaloga demokratîyane ya navhizbî, ne bi diruşm, û belku bi kiriyar selimand ku ew yek şanaziyeke dîrokî ye bo kongireya
16.emîn ya PDKÎ ku dîrokafirandin bi awayê demokratîk nişan da.

Sêyem-Piştî çend salan destpêkirina Rasanê û nixandina xalên bihêz û lawaz ji vê qonaxa nû ji xebatê, kongireya 16.emîn
ya PDKÎ biryara domandin û vegeşandina Rasana Rojhilat dide, ku ew yek jî di pêşerojê de nişan dide ku di xalên guherînê
ên dîrokî de, destbilindkirinên asyaî bo dengdanê, dikare rêveva dîrokê bigihere.

Kongireya Rasana Rojhilat bi serkevtin ve karên xwe bi dawî anî, û biryarên hewce pejirandin, û kire bernamêya karê xwe
bo pêşerojê. Rêberatî û kadr û pêşmerge û endamên PDKÎ dikarin di dîrokê de bersiv bidin, ku gelo pêngavên bikiryar bo
selimandina vê şanaziyeke hilgirtine yan na? Eva dimîne bo pêşerojê ne gellek dûr.

Birêz Mistefa Hicrî di merasima bidawîhatina kongireya 16'an de axavtinek pêşkêş kir

Birêz Mistefa Hicrî lêpirsawê giştî ê PDKÎ di rêuresma bidawîhatina 16.mîn kongireya PDKÎ de, baseke têr û tejî û balkêş li ser birêveçûna serkevtiyane ya kongireyê kir, ku deqa vê axavtinê weha ye:

Hevalên birêz!
Xelkê têkoşer û demokratperwer ê Kurdistanê!
Kadr û pêşmerge û endam û aligirên PDKÎ!

Serkevtina kongireya 16'an, kongireya "Rasana Rojhilat" li we pîroz be

Xûşk û birayên rêzdar, bi xweşî ve kongireya 16'an kongireya "Rasana Rojhilat" piştî heyamekê derengketinê dawî bi karên xwe anî. Ew kongire wekî ên borî ên PDKÎ hinek serkevtin û tiştên nû li pey xwe anîn, ku ezmûna hizba me û herwisa xebata li Rojhilata Kurdistanê dewlemendtir kir.

Deskevtên vê kongireyê hekî ez bi kurtî îşareyê pê bikim, berî her tiştî dixwazim îşarê bi emniyeta kongirê bikim, ku bi silamêfî bi dawî hat. Em agehdar bûn ku rejîma Îranê çend mehnan berî kongirê bi hûrî ve çavdêriya hizba me dikir, da ku dem û cihê kongirê bizane, heta di rojên dawiyê de ku her tişt amade bibû em neçar bûn ku li jêr gefên rejîmê û metirsiyên wê de, cihê kongireya xwe biguherin, lewra çend rojan ew kongire derengtir ket, jî vê roja ku me diyarî kiribû.

Lê ew serkevtina di warê emniyetî de aliyê kêr deskeveke mezin bû, û aliyê kêr ezmûneke bihêz bû, ew ezmûna ew bû ku hemû yên ku, di karûbarê kongireyê de tekoşîn dikirin, û çalak bûn, hewl dan û karîn ku cihê kongireyê nihênî (nepenî) ragirin. Em spasiya hemû wan kesan dikin ku derheq parastina kongirê gellek hewl dan, hemû ew kadr û pêşmergeyên ku wek nûner beşdar bûn û ên wekî parêzer beşdar bûn, û heta malbatên kempa Cêjnîkanê ku di van çend rojan de, alavên teknîkî wekî telefon û internêta bi kar neanîn.

Lewra ew ezmûn girîng bû ku hekî em bi hev re kar bikin, em dikarin di hemû waran de serkevtinên mezin û berçav bi dest binin.

Ji bilî vê yekê gellek kesan kar kirin da ku kongire bi başî bi rê ve here. Yê ku parêzer bûn, li jêr baran û ser-

mayê de kongire parastin, berpîrsên Asayîşê û pêşmergeyên Asayîşê ên hikûmeta Herêma Kurdistanê, û organên pêwendîdar bi karê kongrê di hizbê de, û malbatên kempa Cêjnîkanê û pêşmergeyên ku karê ajotvaniyê û aspêjîyê dikirin, hemiyana dest dane dest hev û bûne sedema serkevtina kongireya me. Xaleke din asta bilind ya basên kongirê bû, ez ku berê di kongireyên hizbê de beşdar bûme, derheq basên ku nûnerên kongireyê kirin, wê carê li ser her sê terhên amadekirî, wekî raorta siyasî ya Komîteya Navendî û bername û peyrew û terhê guhertin di pêkhatiya siyasî ya hizbê de, beşdaran di asteke bilind de, lêkdanewe û şirove li ser kirin, û bi vî rengî ew sê terhê dewlemendtir kirin.

Xaleke din danganîna hejmara endamên jin bû ku li çav kongireyên din gellek berçav bû. Hekî di kongireya pêşîn de bo 20 kesan endamên rêberî, 2 nûner hebûn di nav jina de, vê carê jî 10 nûneran me du nûner hene, yanî %20. Herçen eva cihê razîbûnê nine, lê li gora pêştir cihê kêfxweşiyê ye. Di rastî de çalakiya nûnerên endamên hizbê di nav jinan de, derheq basên kongireyê de cihê dilxweşiyê bû. Lewra ez dibêjim heqê wan bû ku zêdetir jî deng bi wan bihê dan, lê her eva ku em pêngavekê çûne pêş, cihê dilxweşiyê ye. Em hêvîdar in ku ew pêngav rêxweşker be, bo pêngavên me di kongireyên din de.

Hêjano!

Bi boçûna min, me serkevtineke

nû ya din bi dest xist, ku pêkanîna guhertinê di sistem û pêkhatiya PDKÎ de bû. Gellale (Terh) heyama du salan bû di nava rêberî û bedeneya hizba me de behs li ser dihate kirin, bi cudahiya boçûnan, me karî ku di rêberiyê de, li hev bikin ku ew gellaleya ku hatibû pêşkêşkirin, bibe ya Komîteya Navendî, û di dawiyê de di kongireyê de bê pesendkirin, ew mesela jî du aliyan de nû bû, û serkevtin pê ve xuya bû. Yekem eva ku me karî em vê têgihîştinê di nava kadr û endamên rêberiya xwe de bibînin, ku bi hebûna cudahiya bîr û boçûnan li ser pîrsên teşkilatî û pîrsên girîng ên hizbê, em li hev bikin û di berjewendiya hizba xwe de vî terhê dewlemendtir bikin.

Xala duyem her di vî warî de ew bû ku PDKÎ wekî hizbeke pêşkevtî û îroyîn û serdemiyane piştî wan pêngavên ku şehîdê me yê mezin Dr. Qasimlo li salên dawiya 40 û destpêka 50-an, ku vejeriya Îraqê, û bi nivîsîna bername û peyrewa navxwe karî ku PDKÎ jî îzolebûn û jî lawaziya teşkilat û siyasî rizgar bike, û dubare riheke nû pê bibexşe, û PDKÎ bigehîne asteke nû ji bilindî û pêşkevtinê, jî wê demê ve heya niha eva yekem car e ku guhertin di pêkhatiya siyasî û teşkilatî ya hizbê de pêk tîne, li ser bingeha guhertineke serdemiyane, ku pêk tê jî dabeşkirineke deshilatê wekî esleke girîng ya demokrasiyê di vê serdemê de, ku qezzekirina deshilatê jî aliyê hikûmetan û jî aliyê sistemên paşvemaîyê ên deshilatên herêmê ve, kuştin û bîrsîtî pêk aniye. PDKÎ pêngaveke nû hilgirt, renga ku ew pêngava nû armanca me hemi-



Lewra ew ezmûn girîng bû ku hekî em bi hev re kar bikin, em dikarin di hemû waran de serkevtinên mezin û berçav bi dest binin

yan nebe, lê derwazeyê nû hatiye vekirin bi rûyê guhertineke bingehîn de, ku hêvîdar im em di qonaxa di navbera kongireya 16-17-an de, ne tenê her kêmasiyên vê gellaleyê dîsan bi lihevkerinê çareser bikin û pêşve bibin, belku di kongireyên bê de jî em çend pêngavên din di warê parvekirina dehsilatê de herin pêş.

Ez li ser vê baweriyê me ku ew pêngava PDKÎ wê bibe xaleke guhertinê di dîroka PDKÎ de. PDKÎ jî hewcehiyên serdem û guhertinên herêm û Îran û Kurdistanê di hemû beşan de têgihîştîye, û li gora wê jî, bona xwe rêxistina digel wan guhertinan, pêngavên hewce hilgirtine, pêngavek ku

hizba me hevaheng bike digel Rasana Rojhilat, ku em bikarin Rojhilat bikin çeqa xebatê, rojhilatek ku dibe bibe kangeha xebatê li dijî rejîma Îranê bona bidestxistina mafê azadî û bexteweriya xelkê xwe.

Guhertinek ku xelk wir bi çeqa xebatê dizane. Çiya wekî pêşmerge piştvanê bajar dibe. Çiya û bajar hevdu tekmlî û tewaw dikin, û pêkve ber bi azadiya Kurdistanê pêngavan davêjin.

Hekî di sistema pêşîn de hemû deshilat li ber destê yek organî û Komîteya Navendî bûn, niha aliyê kêma deshilat dabeş bûye di navbera du oranan de, du navendan de, yek Navenda Siyasî ye, ku dibe yasayê danê, û yasayên ku hizb dibe kar pê bike, û organên Çavdêrî û Hilbijartin ku li jêr çavdêriya ve de kar dikin, erkên xwe bi rê ve dibe.

Navenda din Desteya Kargêrî ye, ku karên "îcrayî" ên hizbê li jêr rênîşdana wan yasayan de ku Navenda Siyasî made dike, bi rê ve dibe.

Em li PDKÎ de wek pêştir min îşare pê kir, me behsek dûr û dirêj hebûye li ser lihevkerina li ser vî terhî ku bibe cihê hêviya hizba me. Me bi diyalogê demokratane karî ku ve armancê bipêkin.

Her yek ji me ew maf hebû ku wekî dijber yan alîgir li ser vî terhî baxivin, û me qise jî kir. Min gellek caran bas kir ku hemû ewên li ser vî terhî qise dikin, hemû jî li rûyê dilsojî û dîtina baştirîn riyana e, niha jî li ser vî baweriyê me, lewra yên ku dijî vî terhî bûn, û yên alîgir bûn, pêkve hewl dan ku vî terhî dewlemendtir bikin bi pêşniyarên xwe. Lê bi xweşî

ve niha ew gellaleyê bûye bernameya hizba me, di kongireya 16'an de, û rênîşanderê karê me hemiyana e, bi alîgir û dijberên vî terhî ve. Lewra ez vî şiyane di PDKÎ de dibînim ku em hemû pêkve dest bidin destê hevdu bona pêşvebirina vî bernameyê.

Bê guman di piroseya bikiryarkirina vî terhî de, astengî wê bêne pêş. Jiber ku ezmûnek nû ye. Lê kongireyê rê nîşanî me daye ku em çawa bikarin kêşeyên xwe çareser bikin û riya pêşveçûnê pêngav bi pêngav xweş bikin.

Hevalên min ên hêja!

Em demekê dikarin bêjin ku serkevîna me tewaw e, ku em bikarin di piraktîkê de jî, vî bernameyê bi rê ve bibin. Yekem pêngava serkevîna dabeşkirina deshilatê bû. Navenda Siyasî wekî navenda biryardanê û yasadanî ye. Herwisa yekem pêngav bû ku di heyama dehan salên borî de, ku di navenda biryardanê jinan piraniyek bi dest aniye, li çav kongireyên berê. Ji bilî vî yekê Navenda Siyasî bo yekem car organek e ku kesên xwedîşiyana û pispore di nava endamên kongireyê de karîna xwe kandîd bikin, herçend kadr û pêşmerge tewaw wextê PDKÎ nebûn. Eva yekem pêngava vî terhî bû ku derî vekir bo kesên şareza bona vî bûnê û li pêşvebirina PDKÎ de beşdar bin. Eva destpêka pêngavekê ye ku PDKÎ dixwaze kesên di nava alîgir û endamên hizbê de, heta kesên li derveyî hizbê lê demokrat û azadîxwaz bîne nava refên PDKÎ de, û wan di bin sîvana hizbê de kom bike, bo vî ku xebata Hizba Demokrat bibin pêş. Ez hêvî dikim cardin em hemû bikarin pêkve bi hêz û şiyana xwe ku hêz û şiyaneke zor e, di kongireya bê de şahidê

serkevîna gellek meztir û afirandina îde û bernameyên gellek zindîtir û serdemiyantir bin. Min guman tê de nine ku PDKÎ û xebatkarên Rojhilat zerfîyetên ji vî meztir jî hene, û em himbêza xwe ji bo wan vedikin, ew hizba vî xelkî ye, û ji vî zêdetir hizba demokrat di çarçoveya hejmarek kadr û pêşmerge de girêdayî namîne, xebata me xebateke dijwar û bixwîn e, li hemberî rejîmeke paşvematî û kevneperest de, ku mezintirîn dijminê Kurd e li hemû cihanê de. Bona vî ku em xebata xwe li hemberî vî rejîmê de bibin pêş, me pêwîstî bi hêza hemû azadîxwazekî heye, ne tenê li Rojhilata Kurdsitanê belku di hemû beşên Kurdistanê de. Min pê xweş e ku vî yekê jî zêde bikim, ku bi berçavgirtina pêwîstiya alîkarî û karê hevbeş, digel hizbên opozisyona Îranî ên Kurd, û ên Îranî kongire hemû astengî vî dane, destê Navenda Siyasî vekirî hêlaye ku her demekê bi qazanc bizane digel wan aliyan pêwendiyê bigre, karê hevbeş bike, û li dawiyê de bikare bigihîje pêkanîna eniyê hevbeş bona giştîtkirina xebatê û bi cemawerîkirina xebatê di Rojhilata Kurdistanê de.

Bi giştî hekî ez kurt bikim gotinên xwe, eva ye ku em hemû wekî alîgir û endam û kadr û pêşmergeyên PDKÎ, em dilxweş in ku ew kongire bi serkevîneke tewaw ve bi dawî hat.

Serkevîna dawî, lê wê demê ye ku em hemû pêkve ew erkên ku kongirê xistine ser milên me, her yek ji me, em li gora şiyana xwe bibin pêş, û xatircem im ku hemû ew riyên ku me han didin bo vî şeweya xebatê, emê bigrin pêşiya xwe.

Lê derheq xwe, wekî pêşmergeyekî

vî hizbê hez dikim ku li wir ragehînim, rû li kadr û pêşmerge û endam û alîgirên PDKÎ, çî yên ku li dijî gellaleyê bûn, yan jî ên ku digel de bûn, ez xwe bi lêpirsrawê giştî ê hemû vî hizbê dizanim bi hemû bîr û boçûn û cudahiyan ve, (dengê çepikên beşdaran).

Himbêza min vekirî dibe ji bo hemû wan hezkiriyên ku amade ne di vî riyê de û di vî warî de, kar û tekoşînê bikin, ez destê yarmetî û kar û tekoşînê bo we hemiyana dirêj dikim, û hêvîdar im û xatircem im ku her wekî ku we di vî kongireyê de bi dengê bilind bersiva erênî we da vî guhertinê, hûn jî her vî bersivê bidin.

Hevalno!

Bila em ji guhertina netirsîn, tirs û nîgeranî ji dugmbûnê, ji razîbûna bi rewşa heyî, ew şikurdarbûn e bi vî jiyana ku me heye, lê em şoreşger in, şoreşger dibe ku guhertina pêk bîne, wateya şoreşger yanî pêkanîna guhertinan, guhertina ber bi pêşve, û ber bi serkevîna. Erk û wezîfeya me pêşveçûn û ber bi serkevîna ye, hêvî dikin ku ew kongireya pîrr deskevt bibe destpêkeke nû ji serkevîna hizba me di xebata gelê me di Rojhilata Naverast de, û bibe mînakê di dabeşkirina deshilatê di nava kar û têkoşan û îradeya bihêz, di xizmetkirina bi armancên gel û niştimana me de.

Her serkevî bin, sax û silamet û serkevî bin, di xizmetkirina bi gel û niştimana me de.

Gellek spasiya we hemiyana dikin.

»»» Doma sergotarê

ji salekê, ji aliyê endamên hizbê ve ketibû ber bas û berhevdanan, û di encamê de ew terhî ku destpêkê ji aliyê sekreterê giştî ê hizbê ve hatibû amadekirin, paş pêdeçûn û berçavgirtina tîbîniyan di pîlnomên dawiyê ên hizbê de, ji aliyê komîteya Navendî ve, yekdengî li ser pêk hat, û wekî terhê Komîteya Navendî bo guherîna pêkhatiya hizbê, pêşkêşî 16.mîn kongireya PDKÎ hate kirin.

Ew terhî ji aliyê beşdarên Kongirê ve bi awayekî têr û tejlî bas li ser hate kirin, û guherîna bîr û boçûnan li ser hate kirin, û piştî berçavgirtina raya piraniya beşdaran, wekî terhê guherîna pêkhatiya hizbê, bi dengê piranî yê beşdarên kongirê, hate pejirandin.

Beşeke din ya karê kongirê pêdeçûn bi bername û peyrewa navxwe ya hizbê bû. Diyare ku bername li jêr ronahiya rapora siyasî ya Komîteya Navendî, û peyrewa Navxwe jî bi baldan bi naveroka terhê pêkhatiya hizbê hatibû darêtin. Bi vî halî jî beşdarên kongirê, çalakane di pêwendî digel bername û peyrewa navxwe ya hizbê, bi hûrî boçûnên xwe şekere kirin. Di encamê de, bi berçavgirtina tîbîniyên beşdaran bername û peyrewa navxwe ya hizbê ji aliyê nûnerên beşdar di kongirê de hate pejirandin.

Beşa dawiyê ya karê kongirê diyarîkirina lîjneya hilbijartinê, û birêvebirina hilbijartinan bû, bo encamdana vî erkê lîjneyê sê kesî ji endamên Komîteya Amadekar ya kongirê bo çavdêrîkirina bi ser hilbijartinan de hate diyarîkirin, û hejmareke

hevkarên din ji endamên kongirê karê birêvebirina hilbijartinan bi wan hate spartin. Vî lîjneyê destpêkê, hilbijartin bo lêpirsrawê giştî ê hizbê bi rê ve bir, di encamê de hevriyê birêz Mistefa Hicrî bi piraniya dengê beşdarên kongirê, wekî lêpirsrawê giştî ê PDKÎ hate hilbijartin.

Piştî vî lîjneyê karê hilbijartinê endamên Navenda Siyasî bi rê ve bir, û di nava kandîdatoran de, ku hejmara wan berçav bû, ew rêjeya ku kongirê bo Navenda Siyasî pesend kiribû, li çar gerên hilbijartinê de, serkevîyên hilbijartinê ragehand. Di vir de îşare bi vî hewce ye, ku rêjeya beşdariya jinan çî wekî endamên nûnerê kongirê, û çî jî wekî endamên Navend Siyasî, heya qasekê hilkişiyana bi xwe ve dîtibû". Di beşa dawiyê ya vî daxuyaniyê de hatibû: "Hewcehî gotinê

ye ku di navbera qonaxên bernameya kongirê de, lîste û navê wan hizb û aliyên siyasî ên biyanî, Îranî û Kurdistanî, ku peyama bo kongirê şandibûn, ji aliyê komîsyona peyamên Komîteya Amadekar ya Kongirê ve bi aghdariya beşdarên kongirê gihîşt, û lîsta wan peyaman jî hatin ragehandin ku bi navê kongirê ve bo aliyên hewce tê şandin.

Herwisa komîsyonên sikala (şikayet, gilname, doz) û biryarên kongirê jî, erkên xwe bi rê ve birin, û encam bi kongrê ragehandin. Bi vî awayî 16.mîn kongireya PDKÎ serkevîyane dawî bi karên xwe anî, û herwekî pêştir jî îşare pê hate kirin, belge-nameyên kongirê piştî amadebûn û çapkirinê, wê bikevin ber destê xwîneran".

Birêz Mela Hesên Şêweselî axavtineke têrûteji di merasima kongireya 16.mîn de pêşkêş kir

Mela Hesên Şêweselî têkoşer Mendamê "Îftixarî" ê Navenda Siyasî ya PDKÎ axavtineke têrûteji di merasima kongireya 16.mîn de pêşkêş kir, ku deqa wê weha ye:

Hevçeperên hêja!
Xûşk û birayên dilovan!
Têkoşerên riya azadiyê!
Ez pîrr bi dil silavan li we dikim

Bi salan bû ku ez ji dîtina we bêpar bûm. Bi salan bû ku dilê min ji bo we lédida. Di rûniştinan de, di xewnên min de, hertim min bîriya we dikir. Mebesta min ew nine xwedê nexwastî riyakariyê li hizûra we de bikim, dema ku ez diçûme nava xewnên xwe de, ez rast vedigeriyame cem pêşmergeyan, rast dibûme kesek ku sax û silamet e, û di welatê xwe de ye. Kesek ku di Kurdistanê de ye, û digel pêşmergeyan de ye. Di gel kadr û xelkê welatê xwe de, digel kadr û gel xelkê welatê xwe daxivim û wan didim axavtinê, û piştê li hev tûre dibin û carna dibêrin canê hev. Lê piştî li hev tûrebûn û li hev xeyidînê, diçin nava çeperekê de, û piştê me li piştê hev e, li hemberî êrîşa dijminan de radiwestin, û bi sedan carî û bi hezaran carî min ew xewn dîtîye, û min jêve bû êdî nikarim cardin bême vir û li nêzîk ve min guh li dengê pêlavên we bin, û û guhên min ji dengê henaseyên we bin. Lê niha xwe ecêb jî nine, ku min jêve be ku xewn e û ez nehatime. Niha ez baweriyê bi vê dikim ku ez bi cidî bi ceste di nav we de me, ne bi xeyal. Ew yek ji bo min serbilindiyê gellek mezin e.

Di vir de ez şanaziyê zaf dibînim. Diyar e ku hatina bo kongirê bo min şanaziyê zor mezin e, û di rojên dawiyê de jî ku Kulsûm nexweş bû. Hinde nemabû ku ew hatin têk here. Lê naveşêrim, ku wê got hekî em bimrin jî, em dibe her herin. Ez jî teslîm bûm û em hatin xizmeta we. Kongireya 16.mîn ya PDKÎ hate girtin û bi serkevî ve jî bi dawî hat, û min jî aliyê xwe de, dizanî ku ew ê serkevî be. Lê bi vî qasî min çaverê nedkir, ku bi vî qasî jî em dikarin pêkve rûnên, û digel yektir behs û nîaqaşê bikin û pêşîra hevdu bigrin li ser meseleyan, lê heya vî qasî jî em li hev bikin. Ew lihevkerin bo min gellek cihê qedr û qîmetê ye. Min li wir jî erzî xizmeta hevalan kir, ku ew terh terhek nine ku tawan bûbe, yan guneh bûbe, dana terh erka li ser milên her hizbeke siyasî û berpirsyar

e, û hizba me jî ew erkê xwe yê giran bi cih gehandiye. Wê erka li ser milên xwe cîbicî kiriye, iskilêta hizba me sunetî bû, bi dehan sal û heta di hemû temenê xwe de hizba me bi vî saxtarê ve hatibû, û niha ew saxtar guheriyê, rûyê vê guheriyê, wê navika wê jî biguhere. Xatircem im ku ya bo min gellek cihê şanaziyê bû tehemula hevalên me bû, û eqliyeta hevalên min bû. Ez PDKÎ jî mîjve nas dikim. Dr. Qasimlo ku di salên kongireya sê û çar de hat, gellek hewl da ku exlaqê siyasî bîne nava hizbê de.

Exlaqê siyasî ez venaşêrim ku hinek hevalan dij derketin, lê piştê bi tab û tehemul ve ketin bin bandora wê de, û PDKÎ karî ku riya xwe here, û wê riyê bipîve.

Hevalê me yê nemir Dr. Qasimlo jêve bû ku exlaqê siyasî bi tenê bi bê mentiq, bê hikmet, bê felsefe, bi bê lêkdanewe nikare bi rê ve here. Hizba me ew mesele hemû ceribandine, û exlaqê siyasî peya kir û bas ji santiralîzma demokratîk kir, disiplîna nû danî. Disiplînek ku digel zanyariyan têkel bû, û çû pêş. Di vî kongirê de min dît. Min dît ku disiplîna hişyarane bêserûberiyê dixendiqîne, bêberpirsariyê ji nav dibe.

Di heman dem de tundrevî û tîjreliyê radigre, û min bi çavên xwe ew tişt bi rohnî dît. Ya ku bo min gellek cihê şanaziyê bû, min erzî xizmeta we kir. Tab û tehemula yekcar zaf ya hevalan bû derheq boçûnên dijberî hevdu. Min ew eqliyeta bilind (riyakarî nebe, le'inet li riyakariyê) ya hizba xwe bi çavên xwe dît. Her ji xwarê heya serê. Min hişyariyê yekcar zor dît. Ferqeke yekcar zor min dît. Ez ne tenê dikarim bêjim serkevî, belkû ez wekî bazdanekê dibînim, bazdanekê gellek bişyan, bazdan bi ser gellek meseleyan de, derbazbûn bi ser gellek tiştên nexweş de, gihîştina



bi birceke bilind ji fikreke pêşkevî, û ez bi dil ve, van axavtina dikim. Hêviyek zaf bo min çê bû, tu carî berî hatina bo kongirê ew hêviya bilind di min de nebû, ku bi vî qasî ez ji pêşmerge sade ve bigre heya dawiyê bi vî qasî hişyar bibînim, bibînim ku heya vî qasî geşe kiriye. Ez eqliyeteke din di vir de dibînim, ew jî eqliyeta pêkvesazan û pêkvejiyan û digel hevdu lihevkerinê ye. Eva di vir de hinek hevalên din me hene, hevçeperên kevn me hene, ku digel wan, em li rex hev bûn, wê demê girjî di navbera wan de hebû, lê min dît ku degel hevdu çawa dostane serederiyê dikin û radibin û rûdinên, û xwe wekî yek malbat hesab dikin.

Xwe wekî yek hevçeper hesab dikin, digel vî de jî ku kêşe bi hev re hene, cudahiya boçûnan pêkve hene, eva bo min cihê şanaziyê gellek mezin e, ez aliyê xwe de ya ku bo min girîng bû pîrsa domandina Rasanê bû. Me gellek ser Rasanê bas kir û bas kiriye jî, em naçin ser ewên ku pştir hebûn û me gotiye, Rasan wekî tovekê bû di nava qofiyên (qopiyên) deşta Koyê, ku gellek bi bêmirazî û bi nefesên sar, û bi bêkesî çilû da, û rûyê wê pê çêbû, piştê serê xwe hilgirt û bera xwe da deşt û çolan, li wir vegeşiya, lê ew deşt û çol, bûne pirek di navbera çiya û çolan, rewşenbîrên bajarên, ew fikir wergirtin, û şirove kirin, û piştê hilgirtin, û bixwe re birin, bajarên Îranê, gihîşte Tehran, Îsfahan, Qum, Şîraz, li hemû cihê qîse li ser hate kirin, û vegeşiya Kurdistanê, bi awayekî din têrûtejiyê û lojîkanetir, û piştê vegeşiya himbêza hizbê.

Me di Rasanê de gellek qurbanî dan. Lê wan qurbanîyan peyamên gellek

Piştî heyamekê em pêkve rûniştibûn di xizmeta Dr . Qsimlo de. Wî kerem kir ku we bi ya min nekir. Hekî em du salan zûtir hatiban, şoreşa Îranê ya me bû

mezin dane dunyayê. Peyamên gellek mezin dane hevçeperên me, riyekê nû rohn kirin, rast e me ji dest dan, lê wekî refa kotran bû ku bi rastî fir dan û riyekê din di esmanan de kêşan. Ewa ku dikeve ser milên me, dibe em vî riyê bidomînin, û emê bidomînin jî. Diyarê xwîn û rondik dixwaze. Wekî min li wê jî bas kir, mixabin, Rasan aşek e ku bi xwîn û rondikan digere. Bi xwêhdanê digere. Hêvî dikim ku xwîna me tê de nerije. Lê hekî xwîna me jî tê de birije, û hekî em hemû jî tê de herin, û hekî zirareke zêdetir jî li me bikeve, dîsan emê Rasanê bidomînin ji ber ku ez vî wekî stratejiyê dibînim, ew e ku me radikêşe bo armançên serekî, riyên ji me re rohn dike. Bona vî ku em herin aliyê serbestiya yekcarî. Serkevîtinê mezin me bi dest xistine, û me

Şêweselî:

Mixabin Rasan aşek e ku bi xwîn û rondikan digere

sekreter hilbijartiyê, û rêberê nû me hilbijartiyê, û navendeke nû me hilbijartiyê, û deshilat me parve kiriye.

Di parkîdkê de deshilat tê parvekirin, û hêvî dikim ku ewên di Navenda Siyasî û li navenda biryardanê de kar dikin di kiryarê de dema xwe danên bo vê ku bi cidî û bi emelî, di meydana emel de, ya ku wekî teorî di kongirê de bi me hatiye dan, wekî piraktîk bibin pêş. Xatircem im jî, ku emê bibin pêş.

Hevalên min ên hezkirî gellek carana Rojhilata Kurdistanê me serê wê bêkum dimîne. Lê Rojhilata Kurdistanê ew şiyana tê de ye ku bi rastî bersivderê meseleyan be.

Carekê sekreterê hizba me bas ji vê kir û got ku civaka Îranê dikele, rast bû. Gellek dirust bû civaka Îranê ku dikeliya, niha qulteke biçûk daye, lê ew qult wê qultên din li pey xwe bîne. Dijmin bila dilê xwe bi vê xweş neke, ku eva nexêr tewaw bû, û me dawî pê anî. Herwekî min bixwe jî guh lê bû, ew ser vê baweriyê ne ku wan hemû tişt tewaw kir û tewaw bû, lê ne wisa ye, agireke gellek mezin di bin vê xalîşînkê de diteyise. Ew agir tê ser erdê û wê bibe agireke zor mezin, wê berbe canê zordarên dîrokê û axûndan, û seherkerên dîrokê, xatircem im ku gelên Îranê wê serkevtî bin, û ew hereket wê bibe hereketeke tazetir û form digre, û naverokeke din bi xwe ve digre. Em bila xwe biçûk nezainin, min pê xweş ku ser vê meselê gellek pêdagirî bikim, bi xwe gellek caran min xwe li hember gellek meseleyên biçûk de kêr zaniye. Ez şaş bûm ku di nava hevalan de jî vê moralê dibînim ku xwe bi biçûk dizanin, carna neheq jî nînin, jiber ku neteweyek ku di dirêjahiya dîrokê de hatibe serkutkirin û li zewqê hatibe dan, û dilê wê hatibe şikandin, û bi qasî rûbaran xwîn li ber çûbe, neheq nine ku xwe bi kêr bizane.

Lê nabe em xwe kêr bizanin û bi taybetî Rojhilata Kurdistanê, nabe ku xwe bi kêr bizane. PDKÎ nabe ku xwe bi kêr bizane, xwe jî bi kêr nizanane. Rast e em hatine piştguhaxistin, û vê yekê bandor li ser me daniye. Lê herçend em kêr bînin dîsan di hevkeşeyên pêşerojê de em hene, û tu kes nikare di hevkeşeyên pêşerojê de

me wekî, beşeke hevkeşeyan nehesibîne. Lê erk û wezîfeya me ye ku em bikarin me para xwe hebe, hemû hewlên me dibe ew bin ku me para xwe di pêşeroja xwe de hebe, mebesta min pêşeroja piştî rûxana Komara Îslamî ye.

Gellek baş di bîra min de ye ku Dr. Qasimlo hat û beşek ji hevalên me xemsaî kirin, bila ez bixwe jî bêjim ya ku Dr. Qasimlo dixwast bo vegeriya bo nav welat cîbicî nebû. Piştî hat û sepand û Komîteya Zagros pêk hat. Em çûne Îranê. Eyb nine rastiyê bêjim, ku em çûn dereng bû. Hinek dereng bibû, lê em pê re gihîştin û bi hewla xelkê me karî ku cihê xwe di nava wan de, di nav gelê xwe de vekin.

Piştî heyamekê em pêkve rûniştibûn di xizmeta Dr. Qasimlo de. Wî kerem kir ku we bi ya min nekir. Hekî em du salan zûtir hatiban, şoreşa Îranê ya me bû. Niha jî dibêjim ku hekî em lezê lê nekin, piştî rûxana rejîmê, wê me pareke kêmtir tê de hebe. Hekî em li ser van bernameyên ku me danîne, li ser Rasanê me danîne, me pêşbînî kiriye hereket bikin li pêşerojê de, me wê pareke zortir hebe, û em vê yekê bi xenîmeteke zor baş bizanin, û bi derfet bizanin, ku niha hebûna me heye. Me cihek heye, ku ku tê de em çeqî ne, cihek heye ku em lê derbaz bin, herin bo meydana din, bo qonaxêke din. Qonax bi qonax bipîvin, û ezmûnan bi dest bixin, bona vê ku em bigihîjin qonaxa yekcarî. Ez li wir de serkevtina kongireya 16. mîn ya PDKÎ wekî derfeteke zor mezin dizanim û bi burceke taze dizanim, burceke bilind û berfireh. Em têgihîştine. Dubare dikim me gellek caran gotiye ku hekî em şaşiyên hevdu nebînin, zirarên xwe nebînin û astengiyan nebînin ku hatine ser riya me, aliyê baş û xirap yê meseleyan nebînin, ne em, û ne jî Hizba Demokrat nikarin rola xwe ya dîrokî bilîzin. Rola me ya serekî di vir de ye, ku digel hev tefahomê bikin, digel hevdu behs û nîqaşê bikin, û rastî kêşeyan û nakokiyên bîn, lê piştî me li piştî hev be, hevçeperên rasteqîne ên yektir bin, û xatircem im ku emê pêk ve bin, bi vê eqliyeta ku min bas kir, ez dizanim em dikarin bigihîjin gellek ciyan, ew eqliyet gellekî bilind e.



Ez pîrr bi dil pîrozbahiyê li hevalên xwe dikim, û careke din jî di gel vê hemû cudahiya boçûnan ku digel hevdu me hebûye, me karî ku bigihîjin tefahomê, di kongirê de gellek kesên hêja hatin hilbijartin, diyare renga hin kesên hêja û kêrhatî jî ketibin cihekî din. Ez hêvîdar im ku ew jî her bîmînin, û xatircem im jî ku her dimînin. Siyaset carna mirov tê dikeve, û carna bi dilê me nabe, carna berevajiyê boçûna me diçe pêş, lê ya ku di vir de cihê şanaziyê ye, û şanaziyê pê ve dikim, pîrsa xûşkan e, ku hatine û para wa heye di dehsilatê de, û para wan heye, dikarin herin pêş, dikarin boçûnên xwe bas bikin, rêrohnkerên xûşkên din jî bin, û destê xûşkên din jî bigrin, û wan bînin bo qada xebatê. Diyare bi xweşî ve di nav welat de jî, ew hinda ku ez bibînim xelkeke yekcar zêde, di nava xûşkan de jî, mirovên gellek xwebawar û xwegorîker dirust bûn, heta li derveyî welat de jî, ez ecêbgirtî dimînim, ku wan jin û xûşkan çawa

karîne ku bigihîjin vê astê.

Lê di vir de jî dibînim ku bi rastî gihane pileyêke bilind. Ez hêvîdar im ku hemû aliyek serkevtî bin, û hêvîdar im ku careke din derfeta vê bê pêş, ku ez bi xwe û digel malbata xwe, em we himbêz bikim.

Ez vê xelata ku bi Kulsûmê hate dan, bi min hatiye dan, û ez jî li ser serê xwe dadinê, û pêşkêş dikim bi hemû malbatên şehîdan û bi hemû şehîdên Kurdistanê, û bi bê ferq û cudahî, û bi taybetî pêşkêş dikim bi şehîdên Rojhilata Kurdistanê, û wekî diyariyêke mezin di nava malbata me de, heya ku em hene wê her bîmîne, wekî tişteke pîroz emê biperestin, û ez dest davêjim stûyê we û spasiya we dikim, û daxwaza lêborîn li we dikim ku min hûn kêmeke zêdetir ji hed aciz kirin, û wextê we girt.

Silav bo gelê Kurd û bo we

Nerîna Lîderan



Karayilan: “Tirkiye bikeve Efrînê êdî jê dernakeve”.



Buldan: “Ger hikûmetê bixwesta, Ocalan û Qendîlê pêvajoyê berdewam dikir”.



Salih Muslim: “Welatê Misrê gehîştîye wê baweriyê ku, çareserîya herî guncaw bo Sûriyê fedralîzm e”.



Çavuşoglu: “Em dest ji Salih Muslim bernadin!!!”.

Endamên PDKÎ li Pîranşarê sersaxî gotne malbata şehîd “Sebah Rehmanî”

Desteyek ji endamên Demokrat yên bajarê Pîranşarê, bi boneya şehîdkirina heval “Sebah Rehmanî”, di peyamekê de sersaxî gotne malbata navbirî û PDKÎ.

Deqa peyamê bi vî rengî ye:

“Bi boneya şehîd û birîndarkirina du hevalên xebatkar yên PDKÎ bi destên reş yên terorîstên rejîma cinayetkar û xwînmêj a Komara ne Îslamî ya Îranê”

Careke din teror, careke din cinayet û rijandina xwîna Bazên Demokrat ji

aliyê rejîma kindir û îdamê ve, lê eva ku cihê basê ye eva ye ku ev teror û cinayetanên dubare di kûrahiya Başûrê Kurdistanê de û bi nifûza rejîma ne Îslamî çê dibin, ku birastî bo çê dibe kesên xirab şiyana derbe lêdanên bi vî rengî li me hebin.

Her bi vê sebebê jî em beşek ji endamên PDKÎ yên bajarê Pîranşarê, tevî şermezarkirina vê kiriyara terorîstî û nişandana hevxiyê xwe, bi boneya şehîdbûna “Sebah Rehmanî” û birîndarbûna bavê wî yê fermande, “Selah Rehmanî” sersaxiyê li serkirdayetiya Hizbê û hemû endam û pêşmergek qehreman yên PDKÎ re dibêjin, û hêviya cebirîna birînen “Selah Rehmanî” di demên kurt de dikin.

“Bi hêviya hêza tolstandinê ji bo me hemiyar”.



Ciwanên “Dizêya Mirgever” sersaxiyê dibêjne malbata Şehîd

Desteyek ji qehremanên Demokrat yên bajarê Urmîyê, bi boneya şehîdkirina heval “Sebah Rehmanî”, di peyamekê de sersaxiyê dibêjne malbata navbirî û PDKÎ.

Deqa peyamê bi vî rengî ye:

“انا لله وانا اليه راجعون”

Em ciwanên “Dizêya Mirgever” a girêdayî bajarê Urmîyê, ji riya medy-

ayan ve haydar bûn ku, du endamên dilsoj yên PDKÎ û hevalên hezkirî ên me, bûne armanca hovane ya terorîstan, û her bi vê sebebê jî “Selah Rehmanî” birîndar dibe, û “Sebah” jî piştî birîndarbûnê tevî karwana sorxelat a şehîdan dibe.

Em ciwanên “Dizêya Mirgever” a girêdayî bajarê Urmîyê xwe şirikê vê xema kadr û pêşmergek PDKÎ, û bi

taybet malbata wî şehîdî dizanin, û herwisa em hêvî dikin da ku Selah di demeke kurt de tendirustîya xwe bi dest ve bîne.

Ciwanên “Dizêya Mirgever” a bajarê Urmîyê

12.12.1396`an
03.03.2018`an

Keçên Şîrawê heyânî niha jî êş û azaran dibînin

Keçên Şîrawê digel derd û êşên xwe mezin dibin, û heyânî niha jî berpirsên hikûmeta Îranê soz û qewlên xwe bi cî neanîne.

Li gora nûçeya gihîştî Ajansa nûçegihaniya “Kurdpa”yê, heyânî niha zêdeyî 360 emeliyaten neştergerî(cerahî) ji bo ciwanîya rû û serûçavên keçên xwendîngeha “Şîrawê” hatine encamdan, lê parêzerê wan dersxwanan dibêje ku, tu serkevtin û ciwanîyek ji wan re nayê dîtîn.

“Husên Ehmedîniyaz” parêzerê payel yê dadweriyê, rûpelek nû ji bo wergirtina mafê keçên Şîrawê vekirîye, û daxwaz kiriye da ku di demeke kurt de wan keçan ji bo çareserîya pîzişkî ji bo derveyî welat bibin û “Diye” ji wan re bidin. Navbirî bas ji vî jî kiriye ku hekî bersiva daxwazên yasayî yên me neyên dan, emê neçar bin di Tehranê de dest bavêjine girevê.

Li gora gotina “Ehmedîniyaz”,



“Nadiya Salih” û “Mehnaz Mihemedpûr” ji qîzên Şîrawê ne, ku tu demî nikarin bibin xwediyê zarokan, û “Sîma Şadkam” jî, tevî ku 4 caran hatiye emelkirin lê, heyânî niha jî êş û azarên wê dawî pê nehatine. Navbirî bas ji vî jî kiriye ku, “Amîne Rak” zêdetirîn asta şevatê heye, û “Sîma Muradi” jî bi sebebê zorbûna asta şevatê êş û azarê di hevka xwe de dibîne, û hekî ev keça Wezîrê Perwerde û Hînkirên ba, bi vî rengî şevitîba, ev wisa hêsan bi ser de derbaz nedibûn.

Di bûyera xwendîngeha keçan a gundê Şîrawê ya bajarê Pîranşar a girêdayî parêzgeha Urmîyê ya ku, di sala 1391`an de qewimibû, zêdeyî 29 keçên dersxwan ji sedî 25-75 rastî şevatê hatibûn, ku du ji wan bi sebebê zêdebûna asta şevatê jiyana xwe ji dest dan.

Agirgirtina xwendîngeha Keçan a Şîrawê, bandoreke nebaş li ser rewan û civakîbûna birîndaran, endamên malbat û xelkên gundê Şîrawê daniye.

Çend wêneyên kongireya 16.emîn ya PDKÎ



Kursiyên vala ên şehîdan Çeko Rehîmî, Kawe Cewanmerd û Hêmin Mewlannijad



Hevjîna Mela Hesên Şêweselî di merasima kongireya 16.mîn de axavtinek kir



Xatûna Kulsûm hevjinê Mela Hesên Şêweselî piştî wergirtina xelata rêzgirtinê bi boneya xizmetên bi salan bi hevjinê xwe yê kêmendam Mela Hesên Şêweselîyê şoreşger, çend peyvan axivî, û ragehand ku ewê berdewam be di xizmetkirina bi hevjinê xwe yê têkoşer.

Deqa axavtina wê weha bû:

Ez xwe bi serbilind dizanim ku rê bi min hate dan ku di kongireya 16.mîn ya PDKÎ de beşdariyê bikim. Ez bi boneya serkevtina kongireya 16.mîn ya PDKÎ pîrozbahiyê li we rêzdarên

û hêjayan û malbatên serbilind ên şehîdan, kadr û pêşmergeyên qehere-man û li tewahiya gelê Kurd dikim. Bi boneya vê qedirgirtina ku ji me hate girtin, ez xwe hêjayî vê lewha rêzgirtinê nabînim, lê min wergirt û ez ser serê xwe dadinê, eva bo min tişteke gellek mezin bû, hêvî dikim ku bikarim zêdetir xizmeta hevjinê xwe bikim, û bi vê yekê jixwerazî (xobayî) nebim (çepikên beşdarên).

Spasiya we dikim, zor zor spasiya we dikim (çepikên beşdarên). Ez şermendê we me. Hêvî dikim ku hûn hemû serkevtî bin û daxwaza serkevtinê ji we hêjayan re dixwazim.



Pêşmerge li Kongirêsa Amerîkayê ye

Hejmarek ji endamên Kongirêsa Amerîkayê biryar dane filma Pêşmerge ya derhênerê Fransî "Bernard Henri Levy" di nav avahiya Kongirêsa Amerîka de were nîşandan.

Feylesof, nivîskar û derhênerê bi eslê xwe cihû yê Fransî Bernard Henri Levy dibêje ku karvedanên Amerîka piştî bûyerên 16ê Cotmehê xiyanetek bû li hemberî Kurdan û hinek ji endamên Kongrêsa Amerîka jî wê rastiyê dizanin û ji çawaniya mûamelekirina îdareya welatê xwe ligel wê bûyerê dilgiran in.

Bernard Henri Levy ji Rûdawê re ragihand ku biryara nîşandana filmê Pêşmerge ji aliyê çend endamên kongirêsa Amerîka ve hatiye dayîn û ew endamên kongirêse fêm dikin ku xiyanetkirina Amerîka li Kurdan cihê şermezariyê ye û şaşiyê mezîn a siyasî ye.

Filmê Pêşmerge di sala 2016an de, di nava germiya şerê li dijî DAIŞê de hatibû kişandin û di heman salê de li Festîvala Canesê ya Nvdewletî de hate nîşandan. Ev film roja sêşemê demjimêr 7ê êvarî bi dema Washingtonê di nava Kongrêsa Amerîka de tê nîşandan. Bêrnar Lêvî daxwaz ji Kurdên Washingtonê û derdora wê kir, ku beşdarî merasîma nîşandana filmê Pêşmerge bibin. Di filma Levy de behsa rola Hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê di şerê Mûsilê de tê kirin. Rudaw



Nabînekî Kurd bi guhdarîkirina Dilşad Seîd fêrî kemanê bû

Sîpan Elî ku ji zarokatiyê ve ji nîmeta dîtîne bêpar bûye, dema ku destê xwe bigihîne her amûreke muzîkê, dikare dengê watedar û gelek xweş jê derxe. Sîpan diyar dike ku nabîniya wî li hember bidestxistina piraniya xewnên wî, nebûye asteng.

Kurdê ji Rojavayê Kurdistanê Sîpan Elî di sala 1990an de li bajarê Qamişloyê jidayîk bûye û nêzîkî çar sal in li Almanyayê penaber e. Sîpan behsa jiyana xwe ya li Rojavayê Kurdistanê dike û dibêje ku jiyana jî bo nabînekî weke wî, gelek ne xweş bûye, ji ber vê yekê tenê heta pola 3an a navendî xwendiyê, ew jî bi zor û zehmetî.

Tembûra ku li mala Sîpan hebû, gelek tiştan jî bo wî qerebû dike. Sîpan Elî dibêje: "Tembûreke bavê min li malê hebû, min pir dixwest bijenim, lê xewna min jenîna kemanê bû." Xewna Sîpan Elî bi alîkariya mamoste-

steyekî, bûye rastî. Sîpan dibêje: "Ez çûm cem gelek kesan daku min fêrî jenîna kemanê bikin, lê ji min re gotin 'jenîna kemanê ji bo nabînekî weke te gelek zehmet e'. Herî dawî mamoste- steyekî bi navê Riyaz destê min girt. Mamoste Riyaz li zanîngehê bikaranîna amûra vîolînê xwendibû. Mamoste li ser telefonê jî bo min nota tomar kirin, min jî guhdarî dikir û piştî min dijenî, êdî bi vê rêyê fêrî jenîna bûm." Sîpan tenê bi vê yekê ranaweste, li cihê ku darsa muzîkê wergirtiye, bûye mamoste û darsa muzîkê dide zarokan. Sîpan Elî dibêje: "Min li peymangeha Mîtzo, xwe fêrî jenîna muzîkê kir, Rojgar hat û mamosteyê ku darsa vîolînê dida, çû Başûrê Kurdistanê, lewma ji min daxwaz kir ku ligel hevalê wî ders bidim, peywira wî nota bû, min jî serperîştîya aliyên din dikir."

Hunermendê Kurd ê navdar Dilşad Seîd ku vîolîn dijene, gelek bandor li ser Sîpan Elî kiriye. Sîpan dibêje:

"Dilşad Seîd gelek bandor li min kir, bi awayekî berdeham guhê min li muzîka wî bû, ez dikarim bibêjim ku bi guhdarîkirina Dilşad Seîd fêrî jenîna kemanê bûm."

Sîpan beriya ku koçî Almanyayê bike di navbera salên 2011 û 2014an de, bi gelek koman xebitiye, wî dixwest bibe rojnamevan yan jî muzîkjen. Sîpan Elî dibêje: "Xebata li radyoyê jî bo min ezmûneke xweş a karkirinê bû. Min ji zaroktiyê ve dixwest bibim rojnamevan yan jî muzîkjen. Herdu xewnên min bûne rastî."

Lê belê hinek xewnên Sîpan hene ku bi cih nebûne. Sîpan dibêje: "Ez dixwazim ligel komeke orkestrayê muzîk bijenim. Lê ev gelek zehmet e û divê bikarî notayan bixwîni û bijeni, ev xewna min bi cih nehatiye." Sîpan beşdarî gelek festîvalên gelan ên li bajarên Almaniya û welatên cîran ên Almanyayê bûye, lê du aheng ti car jî bîra Sîpan naçin. Yek ji wan; ahenga piştgirîya referanduma Başûrê Kurdistanê ku li Almanyayê hat sazîkirin, ya duyem jî; ahenga şermezarkirina 100mîn salvegera rêkeftina Sykes-Picot.

Sîpan Elî jî bo hunermendên Kurd ên navdar Birader û Hesên Şerîf muzîk jeniye, herwiha ligel koma îranî, efxanî û almanî jî muzîk lê daye. Sîpan diyar dike: "Min her roj nêzîkî 8 saet rahênan li ser kemanê kiriye, daku bi başî fêr bibim." Rudaw



Yaşar Kemal di sêyemîn salvegera mirina xwe de hat bibîranîn

Nûser û romanûsê navdar Yaşar Kemal ê ku weke beşeke mezîn ji edebiyata Tîrkiye tê zanîn, di sêyemîn salvegera koça xwe ya dawîn de hat bîranîn. Weqfa Yaşar Kemal û Şaredariya Stenbolê bi dîdariyê taybet, Yaşar Kemal bibîrxist.

Romanûs û yek ji mezintirîn nivîskarê cihanê Yaşar Kemal, piştî koça xwe ya bi 3 salan, bi hêz û bandora pênûsa xwe ve tê bibîranîn. Nivîskarê ku xwedî dehan roman û pirtûkên corên din ê wêjeyê ye, li Stenbolê bi

beşdariyê qerebelix hate bibîranîn. Beşdaran qîmeta wî bi bihayê zêr nîşan dan.

Şaredarê Sariyerê Şukru Genç ji Rûdawê re wiha got: "Em qîmetê girîng didin çand û hunerê. Yaşar Kemal jî sergovendê vê qîmetê ye. Me navê wê navendê jî kir Yaşar Kemal. Yaşar Kemal kevneşopî û çanda Anadolê ye. Heke em karibin wî fam bikin, em hewceyî tu lêgerînên din ên jî derve nabin."

Bername li Naveanda Çandê ya ku bi navê Yaşar Kemal hat sazîkirin. Gelek

kesên naskirî, nûser û akademîsyen jî beşdarî bîranînê bûn. Peykerê Yaşar Kemal ê ji şimayê ku ji koleksiyona Madame Tsuaad de cih digire jî pêşwaziya xelkê kir.

Weqfa Yaşar Kemal pêşengeheke posteran jî li salona bîranînê vekir. Kitêbên wî, gotar û vecîzeyên wî û gelek demên jiyana wî jî pê re hatin nîşandan. Hevjîna Kemal, Ayşe Semîha Baban jî li wir bû û behsa mezinahiya pênûsa wî kir. Seroka Weqfa Yaşar Kemal Ayşe Semîha

Baban jî derbarê hevjinê xwe de wiha got: "Yaşar Kemal bi rastî kesekî derveyî rêzê û fewqilade bû. Ew bi rastî dilekî mezîn bû. Divê dil û aqil li kêlaka hev be. Bawerim tiştê jê re namûs tê gotin jî ew e. Ew tişt bi Yaşar Kemal re jî bi tîra xwe hebû. Ew wendahiyeke mezîn e. Ya rast ne wendahî ye jî ji ber ku tiştên ku wî li dû xwe hiştine me her zengîn dikin."

Di panela ku li ser edebiyata wî hate lidarxistin de jî hosteyiya wî bi pirqolî hate nîrxandin. Yaşar Kemalê ku rêya wî ji Bakurê Kurdistanê dest pê kiriye, weke lehengê wêjeya geleri ya Tîrkiye tê pênasekirin. Rudaw

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

2. Hokerên demê (demkî, demîn):

- Ev hoker ji aliyê demê ve çalakiyan didin nasîn.
- Bo kifşkirina peyvên van, pirsên bi (kengî, çi demê, çi wext, hwd) li lêkerên pêveberî tên kirin.
- Dem, li sê beşên sereke dabeş dibin : Dema niha, dema borî û dema bê.

Peyvên demîn, bi van beşan ve têkildar in.

Ji hokerên demê : Îro, duh, pêr, sibehê, sibeh û êvar, sibehê zû, zû, roj bi roj, rojekê, êvarkî, berê êvarê, nîvro, piştî nîvro, gav, wext, berî bîskeke, saet, bi saetan, meh, îsal, par, biharê, havînê, payîzê, zivistanê, hwd.

Mînak 516 : Hokerên demê : Çend bikaranîn :

- Nalîn berê êvarê dixebite.
- Ew her sibeh diçe kursa dantêlê.
- Rojhat wê havînê li mala kalê xwe dima. ç. Wî li wir bi roj kar dikir.

3. Hokerên cih û bergehê :

- Ev hoker ji aliyê cih û bergehê ve çalakiyan didin nasîn.
- Bo kifşkirina peyvên van, pirsên bi (li ku, li kuderê, ji ku, ji kuderê, di ku de, bi ku ve, ji ku ve, hwd) li lêkerên pêveberî tên kirin.

Ji hokerên cih û bergehê :

- Ji yê cihê : Vir, li vir, wir, li wir, pêş, li pêş, paş, li paş, jêr, jor, nêz, derdor, dûr, her derê, dereke din, li çepê, li rastê, hwd.

2b. Ji yê bergehê : Bi vir de, bi wir de, ber ve, serejêr, serejor, ber bi, ber bi ve, ji vî alî ve, ji wî alî ve, ji vê hêlê ve, ji wê hêlê de, hwd.

Mînak 517/1 : Hokerên cihê : Çend bikaranîn :

- Xama xezal li wir diçêriya.
- Nêçîrvan li jêr bû, lê dinêriya.
- Xezal beziya paş zinarê, li çepê rawestiya. ç. Nêçîrvan çû dereke din.

Mînak 517/2 : Hokerên bergehê : Çend bikaranîn :

- Xama xezal serejêr rewiya.
- Nêçîrvên, ji wî alî ve da dû wê...

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

- Şil e sawar, sê şil e sawar.
- Şivanî merr e lerr lewerrên, ew merr e lerr e le roxî rê û le lêrrî melewerrêne.
- Qal e qît e. Qeytanî qaçî qirtand.
- Qet qel le kelî qeşqey kewî nabê.
- Qela kew qirrkin.
- Qel e reşey ser gumetî, hur hur kilkî dekuî, pilim be pitit, piti be pilim.
- Qel e reşa reş rîhanî, tîla min di pinda te, pinda te di tîla min.
- Qel e paçkey sere mêtî, car car kilkî debizwênî, xişip kilk im be qingî, xişip qinkî be kilk im.
- Qurrî korê kerî qirr kir.
- Qulî kurek hebû, kurê qulî kewek hebû, çi kew ji kewê kurê qulî xurt tir nebû.

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja!
Hûn dikarin bersiva
tiştonekan bi riya E-Maila
Agiri2003@gmail.com ji
me re bişînin



Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (321)

Wêneyên merasima bidawîhatina kongireya 16.emîn ya PDKÎ

